ŞAHIDIYÊN JINÊN SERLÊDER ÊN KOMELEYA JINAN A WAN STARÊ

# RAPORA ÇAVDÊRIYA MAFAN JI BO TÊKOŞÎNA LI DIJÎ ŞIDETA JINAN

2023

Ev weşan, bi piştgiriya darayî ya Yekîtiya Ewropayê (YE) di çarçoveya Bernameya YEyê ya Etkinizê de pêk hatiye. Tenê Komeleya Jinan a Starê ji naveroka vê weşanê berpirsyar e û bi ti awayî fikr û ramanên Yekîtiya Ewropayê nîşan nade.

**Amadekar:** Ruken Ay
**2023**

*"Em ên ku li derveyî çarçoveya pênaseya jinan a pêşqebûlên vê civakê disekinin; em ên ku di nav sêniyeke cudahiyan de tên helandin –ên hejar, ên lezbiyen, ên reşik, ên salmezintir-, em dizanin ku mayîna li jiyanê ne şiyaneke akademîk e. Mayîna li jiyanê fêrbûna vê yekê ye ka mirov çawa dikare bi tena serê xwe li ser pêyan bimîne bêyî ku eleqeyê bibîne û carina jî rastî heqaretan were; mirov çawa dikare dinyayeke nû pênase bike ku em hemû tê de tevî kesên din ên derveyî çarçoveya pênasekirî mezin bibin  û mirov çawa dikare dozeke hevpar a fedayî vê lêgerînê bi rê ve bibe. Çinku amûrên efendiyî ti carî nikare mala efendiyî hilweşîne. Ev amûr bo maweyekê dikarin bihêlin em efendiyî di nav lîstika wî bi xwe de têk bibin lê ti carî wê derfetê nadin me ku em guherîneke rasteqîn pêk bînin. Û ev diyarde, tenê rewşeke gefxwir e bo wan jinên ku hê jî mala efendiyî wekî tekane çavkaniya piştgiriyê bi nav dikin."*

**Xwişka Derekî /Audre Lorde**

# Naverok


DESTPÊK 1

Çima hewcehî bi vê xebatê çêbû? 3

Çarçoveya xebata çavdêriyê çawa pêk hat? 3

REWŞA HEYÎ 5

RÊBAZ 7

ENCAMÊN ÇAVDÊRIYÊ 8

Jinan çawa biryar da serî li komeleyê bidin? 11

Berî serlêdana komeleyê, serî li kîjan saziyan dihat dayîn? 12

Piştî şidetê herî pêşî serî li ku hat dayîn û çawa bi encam bû? 13

Rêjeya agahiyên derbarê mafan û mekanîzmayên peywendîdar de 14

ENCAM Û PÊŞNIYAZ 15

Pêşniyaz 16

# DESTPÊK

Îro roj li Tirkiyeyê û li dinyayê, hin ji pirsgirêkên serekî yên têkoşîna parêzvanên mafan hiyerarşî û zordariyên zêde yên wekî pederşahî, ehlaqa giştî, pergala duzayendîtiyê, nijadperestî, neteweperestî, cureperestiyê (speciesism) ne ku cuda ne û/an jî piştî pergalên pir-desthilatî tên. Awayên tehekumê yên wekî cudakeriyê an newekheviya zayendiya civakî, her wekî ku em hemû şahidiya wê dikin, li ser hemû candaran encamên xwe yên rûxîner hene.

Komeleya Jinan a Starê, ji dema damezirana wê ya 2019an vir ve bi armanca ku tevkariyê li wekheviya zayendî bike, li Wanê û bajarên derdora wê xebatên li ser newekheviyên qadên cuda bi rê ve dibe û hewl dide van pirsgirêkan aşkera bike.

Ev rapora çavdêriyê, di çarçoveya Piştgiriya Çavdêriya Mafên Mirovan a Bernameya YEyê ya Etkinizê de ji aliyê Komeleya Jinan a Wan Starê ve hatiye amadekirin. Armanca xebatê ew e ku li gor agahî û tecrubeyên wan jinên ku tûşî şidetê bûne û serî li Komeleya Jinan a Starê dane, tabloya li Wanê ya eleqedarî cudakerî û şideta hemberî jinan a wekî îhlaleke mafê mirovan û mekanîzmayên têkoşîna li dijî şideta herêmê di nav çarçoveyeke standardên neteweyî û navneteweyî de bêne şopandin.

Bi vê xebata çavdêriyê hewla wê tesbîtê hatiye dayîn ka jin di nav peywendeke wekheviya zayenda civakî û şideta hemberî jinan de çiqas hay ji mewzûatê û mafên heyî hene û hatiye vekolan ka çiqas dikarin xwe bigihînin van mekanîzmayan. Herweha bi vê xebatê lêhûrbûnek li ser astengên li pêş serlêdanan û pirsgirêkên di wan pêvajoyan de hatiye kirin ku jin tûşî şidet û cudakeriyê dibin û serî li van mekanîzmayan didin. Di vê xebatê de hewla peydakirina nûveyan hatiye dayîn ku ka bi armanca tevgerandina mekanîzmayên lêgerîna mafên jinan û yên astengkirina şidetê lazim e kîjan rê û rêbaz bêne şopandin.

Armanca herî serekî ya vê xebatê tevkariya jinavbirina şideta li ser esasê zayenda civakî ye ku yek ji wan astengan e li pêş beşdariya wekhev a jinan di her qadeke jiyanê de. Ev xebat şideta hemberî jinan wekî encameke newekheviya zayenda civakî dibîne û ji têgeha “wehkeviya li hemberî qanûnan” dibihure ku temsîlkera têgihiştineke wekheviya teşeyî ye. Ev xebat bi fikreke weha hatiye amadekirin ku wekheviya fersendan wekî navgînekê dihesibîne heta ku wekheviyeke temam pêk tê, û balê dikişîne ser hewcehiya veguherîna têkiliyên zayenda civakî. Encamên di çarçoveya vê xebata çavdêriyê de hatine bidestxistin, nîşan didin ka mekanîzmayên herêmî yên têkoşîna li dijî şidetê çiqas kartêker dixebitin, ji ber kîjan aloziyan mafên jinan tên îhlalkirin û kîjan saziyên berpirsyar ên têkoşîna li dijî şidetê kîjan berpirsyariyên xwe li gor standardên neteweyî û navneteweyî pêk neanîne.

Vê rapora çavdêriyê herweha di nirxandinên xwe yên çavdêriya binyadî ya polîtîkayên giştgir ên wekheviya zayenda civakî de, şirove kiriye ka destberdana îradeya siyasî ya ji wekheviya zayendî di metn û polîtîkayên fermî de çawa xuya bûye û encamên vê yên çawa di tetbîqkirinê de hebûne. Peymana Stenbolê ya ku wekî "standarda zêrîn" a têkoşîna li dijî şideta jinan tê qebûlkirin, di 11ê gulana 2011an de hatiye îmzekirin û di 4ê tebaxa 2014an de ketiye meriyetê. Armanca peymanê ew e ku rê li ber şideta hemberî jinan û şideta nava malê bigire, yên merûzî şîdetê bûyî biparêze, şidetkaran ceza bike û polîtîkayên berfireh ji bo têkoşîna hemberî şidetê bi rê ve bibe. Peymana Stenbolê ji aliyê hemû welatên endam ên Konseya Ewropayê ve hatiye îmzekirin û ev peyman cudatir ji peymanên pêştir ên navteweyî, mekanîzmayeke wê ya çavdêriyê ya bi navê Koma Pispor a Çalakiyên li dijî Şideta Jinan û Şideta nav Malê (GREVIO) heye. Peymana Stenbolê, balê dikişîne ser berpirsyariya têkoşîna dewletan li hemberî şidetê, bi navbeynkariya GREVIOyê çalakiyên welatan ên vê qadê di nav çarçoveyeke qanûnên navneteweyî de dinirxîne û wê armancê dide ber xwe ku piştgiriya polîtîkayên neteweyî bike.

Ji ber ku hikûmetek bi daxwaza xwe îmzeya xwe ji peymanê vekişand, daneyeke din a berbiçav a rapora me jî nîşan dide ku rêya bo edaletê ya li pêşiya jinên di koma dezavantaj de hatiye girtin. Hin nûveyên giring ên raporê ku bala me dibin ser rastiyan ew in ku jin nikarin hesteke pêbaweriya berdewam digel mekanîzmayên piştgiriyê danin, nikarin bigihîjin xizmetên bi zimanê xwe yê dayîkê bo daxwazkirina mafan û pê re pê re jin hejartir dibin.

## Çima hewcehî bi vê xebatê çêbû?

Armanc ji vê xebata çavdêriyê ew e ku bi serlêdanên bo komeleyê yên sala 2022 û 2023yan û bi tecrubeyên merûzbûyiyên şidetê bê zanîn ka xizmetên di bin navê mekanîzmayên piştgiriyê de li gor standardên navneteweyî tên birêvebirin an na û tevkarî li geşedana tetbîqa vê yekê bê kirin.

Armanca vê xebatê ew e ku,

- Tecrubeyên jinên merûzî şidetê berbiçav bin,
- Pirsgirêkên xizmetê di mekanîzmayên piştgiriyê yên têkoşîna hemberî şidetê de berbiçav bike,
- Pêşniyazên baştir bo saziyên eleqedar pêşkêş bike,
- Nerîteke çavdêriya berdewam, sîstematîk û serbixwe bide destpêkirin,
- Tevkariyê bike li geşedan û sazbûna feraseteke demokrasiyeke beşdar a hesas bo newekheviyan û li ser bingeha zayendeke civakî li Tirkiyeyê.

## Çarçoveya xebata çavdêriyê çawa pêk hat?

Xebata me ya çavdêriyê ji wan daneyên serlêdanê pêk tê ku salên 2022-2023yan ji nav Wanê û bajarên derdora wê bo me hatine kirin. Ev xebata ku bi taybetî li ser van bajarên berbehs e ku civatên wê bi piranî kurdîaxêv in, şideta mêran a li hemberî jinan û mafên îhlalkirî yên jinan di nav vê peywend û rasteqîniyê de hatine vekolan. Ev maf, mafên bingehîn in ku bi Beyannameya Gerdûnî ya Mafên Mirovan hatine tesbîtkirin û ew maf jî tê de hene ku statuya xweser a jinan hatiye berçavkirin û tên nîşandan ji aliyê mekanîzmayên ku şideta hemberî jinan asteng dike. Mafê jiyanê, mafê bidestxistina edaletê û mafê beşdariyê hin ji van mafan in.

Di rapora me de giringiya parastina mafên mirovan a di qadeke navneteweyî de bi çend astên cuda derdikevin holê. Ji bo Tirkiyeyê giringiyeke zêde ya sîstemên parastina mafên mirovan heye ku Neteweyên Yekbûyî û Konseya Ewropayê ew çêkirine. Qismekî belgeyên mafên mirovan bi aşkerayî hin tenzîmên eleqedarî şideta hemberî jinan tê de hene, qismekî din tenzîmên eleqedarî qedexeya cudakeriya zayendî û wekheviya jin û mêran tê de hene. Qismekî din ê belgeyan jî ji ber ku metnên bingehîn in, wekî rêbernameyekê ne di mijara astengkirina şideta hemberî jinan de. Di mewzûata neteweyî de jî hin tenzîmên eleqedarî wekheviya jin û mêran û şideta hemberî jinan hene. Makeqanûn, Qanûna Welatiyan, Qanûna Cezayan, Qanûna Derheqê Parastina Malbatê û Astengkirina Şideta Hemberî Jinan hin ji van tenzîmên serekî ne. Piraniya têgehên eleqedarî têkoşîna li dijî cudakerî û şideta navmalî ya hemberî jinan ku di van tenzîmên neteweyî de cih digirin, li ser bingeha van peymanên navneteweyî saz bûne. Li gor xala 90em a Makeqanûnê, peymanên navneteweyî yên

eleqedarî maf û azadiyên bingehîn ên li gor usûla xwe, parçeyekî hiqûqa navxweyî ne. Ji ber ku ev tenzîm bi rêya qanûnan hikmên cuda di heman mijarê de dide, di neliheviyan de peymanên navneteweyî tên esasgirtin.

35emîn Biryara Pêşniyaza Giştî ku Komîteya CEDAWê tîrmeha 2017an li jêr sernavê "Şideta li ser Zayenda Civakî ya bo Jinan" qebûl kiriye, diyar dike ku astengkirina şideta hemberî jinan ji aliyê dewletan ve wekî qanûneke hiqûqî ya navneteweyî hatiye qebûlkirin. Biryara Pêşniyaza Giştî, hin cudahiyên weha diyar dike ku şideta li ser zayenda civakî ya bo jinan lazim e di hin rewşan de wekî îşkenceyê bê qebûlkirin û astengiyên li hemberî mafên zayînê jî wekî şideta li jinan bê qebûlkirin. Biryara Pêşniyaza Giştî digel vê yekê, hin daxuyanî û pêşniyazên bi hûrgilî dike li ser sedemên bingeha şideta hemberî jinan û bergiriyên astengkirina vê şidetê.

# REWŞA HEYÎ

Li Tirkiyeyê, tevî ku hin tenzîmên baş ên qanûnî bi saya têkoşîna Tevgera Jinan hatine kirin bo ku rê li ber şideta hemberî jinan bigire û jinên merûzî şidetê mayî biparêze, hê jî pirsgirêkên giring di tetbîqkirina qanûnan de derdikevin holê. Çavkaniyên serekî yên van pirsgirêkan jî ev in: Çalakî û gotinên ku bi daxwaza hikûmetê pêk tên û newekheviya zayenda civakî meşrû dikin, destpênebûna binyada îdarî ku tetbîqa qanûnan pêkan dike û helwestên kêfî yên tetbîqkerên qanûnan ku rastî ti cezayan nayên. Wekî saziya amadekar a raporê, ev xebata çavdêriyê li bajarekî di bin rêveberiya waliyê qeyûm de hatiye kirin ku ev rêveberî derbeyeke mezin e li demokrasiya ku mafê hevwelatîbûneke li gor Beyannameya Gerdûnî ya Mafên Mirovan e.

Tenzîmên hiqûqî yên di çavdêrî û nirxandina vê raporê de referans hatine girtin: Peymana Têkoşîna li dijî Şideta Navmalî û Hemû Şidetên li hemberî Jinan (Peymana Stenbolê), Peymana Tunekirina Hemû Cudakeriyên li hemberî Jinan (CEDAW), Qanûna Derbarê Parastina Malbatê û Astengkirina Şideta Hemberî Jinan (Qanûna hejmar 6284ê), Qanûna Cezaya Tirkî ya Hejmar 5231ê (TCK), Qanûna Welatiyan a Hejmar 4721ê û Qanûna Parastina Zarokan a Hejmar 5395ê.

Di nav 2 salên borî de li Wanê 23 jin bi şideta mêran hatin kuştin û 6 jinên di bin 18 salan re û 11 jinên di ser 18 salan re bi hin sedemên nediyar întihar kirine. 13 bûyerên şidetê hatine dîtin ku failên wan ên mêr personelên rêkxistina ewlehiya giştî ne.[1]

Komeleya Jinan a Starê, eger serlêdaneke rasterast bo wê nehatibe kirin jî, mudaxilî bûyerên şideta asîmetrîk û tacîza li jinan bûye, dozên wan şopandine û ew kirine rojev û ji bo vê mijarê hewl daye mekanîzmayên şidetê tevbigerîne.

Hêja ye ku em cardin wek şahidiyeke giring tesbîta jêrê ya Rêxistina Efûyê di bîr bînin ku weha gotiye di rapora[2] xwe ya eleqedarî şideta zayendî de ku jinên li Tirkiyeyê dema desteserbûnê tûşî wê hatine:

> *"Herçend hemû jinên li Tirkiyeyê di nav talûkeya şidetê de ne jî, Rêxistina Efûyê ya Navneteweyî di mijara merûzmayîna şideta karmendên dewletê de ji ber hin pênaseyên cudakeriyê bi endîşe ye ku bi taybetî jinên kurd ên herêma başûr-rojhilat û jinên xwedî fikrên siyasî yên nepejirandî bo hikûmet an jî artêşê, di nav talûkeyeke zêdetir de ne. Şideteke weha, îhlala wan mafên*

1 https://www.otekileringundemi.com/star-kadin-dernegi-yillik-raporunu-acikladi
Jinnews, kuştinên jinan û mirinên gumanbar, 2023-2023

2 https://www.amnesty.org.tr/icerik/turkiyekadinlara-yonelik-gozaltinda-cinsel-siddete-son

*girêdayî ewlehiyên navneteweyî ye jî ku divê mirov îşkence nebîne û tûşî miameleyeke rûmetşikên û der-mirovayetî nebe. Jinên ku diwêrin serpêhatiyên xwe qal bikin, zehmetiyeke zêde dikêşin ku edaletê bi dest bixin û ew hem ji aliyê dewletê hem ji aliyê civakê têne bêdengkirin.*"

Komeleya Jinan a Starê van bûyerên şidetê bi nasnameya xwe ya mafparêziyê dişopîne û dihêle ku neyê jibîrkirin. Di vê rapora amadekirî de bûyerên şidetê yên ne bi awayê serlêdanê bo komeleyê, nîşan didin ku sînordariyên li ber jinan ên bo gihiştina mekanîzmayên piştgiriyê hin astengiyên mezin in. Bidestxistina mekanîzmayên piştgiriyê bi beşdariya aktîf ya hevwelatîbûnê mimkin e ku dînamîkeke giring e di avakirina wekheviya zayenda civakî de. Beşdariya hevwelatîbûna aktîf a ku di avakirina wekheviya zayenda civakî de dînamîkeke giring e û sûdwergirtina xizmetên şaredariyê ku di vê mijarê de pîvaneke giring a demokrasiya beşdar e, bi wezîfedarkirina qeyûman a sala 2016an (wezîfedarkirina qeyûman di hilbijartineke herêmî ya paştir de jî berdewam bû) sekinî û hat dîtin jin jî di rolên beşdariya hevwelatîbûna aktîf de bûne sebebê binketinên trawmatîk.

Li Tirkiyeyê tenê 145 stargehên jinan hene. Sala 2016an jî stargeha di bin banê Navenda Jiyanî ya Rojînê ya girêdayî Midûriyeta Polîtîkayên Jinan a Şaredariya Bajarê Mezin a Wanê de, ji aliyê rêveberiya qeyûmî ve hat girtin.[3]

3 https://www.cumhuriyet.com.tr/haber/kayyim-kadin-siginma-evini-kapatti-653239

# RÊBAZ

Ev xebat di demeke pir kurt de temam bû û mehên îlon û çiriya pêşîn a 2023yan li xwe digire.


Di merhaleya ewil a xebatê de stratejiyeke çavdêriyê hat nivîsîn. Li gor stratejiya vê çavdêriyê, armancên serekî yên çavdêriyê, pêngavên çavdêriyê û nexşerê hatin diyarkirin.

Çavkaniya serekî ya xebata çavdêriyê ji tecribeyên wan jinan pêk tê ku di navbera kanûna paşîn a 2022yan û çiriya pêşîn a 2023yan de serî li Komeleya Jinan a Starê dane. Digel analîza formên serlêdanê, formeke hevdîtinê hat amadekirin ku li ser tecribeyên merûzbûyiyên şidetê bû û bi 10 jinan re hevdîtinên rûbirû pêk hatin.

Tenê di ser serlêdan û formên hevdîtinê re analîza daneyan pêk hat. Ev xebat, wek merhaleya ewil a çavdêriyê hat sêwirandin. Bo merhaleya duyem, plan ew e bo demên paştir di têkoşîna li dijî şideta jinan de çavdêriya saziyê pêk bê.

# ENCAMÊN ÇAVDÊRIYÊ

## Rêjeya Temenê Serlêderan





Zêdetirî nîviyê serlêderên Komeleyê yên sala 2022yan jinên koma 35-44 salî ne, serlêderên sala 2023yan jî zêdetir koma 24-34 salî ne.

## Asta Perwerdehiya Serlêderan




Piraniya serlêderên jin ên komeleyê hem di sala 2022 hem di sala 2013yan de kesên nexwendewar in.

## Rewşa Malbatî ya Serlêderan




Piraniya jinên serî li Komeleya Jinan a Starê dayî zewicî ne. Di serlêdanên sala 2023yan de hatiye dîtin ku hejmara jinên nezewicî zêdetir bûye.


## Sedema Serlêdanê




Şidet ji ber ku her tim wek cureyekê tenê nayê dîtin û ji ber ku pirtebeqeyî ye, xwe dispêre newekheviyên hêzî û di nav têkiliyan de bi metodên cuda tê sepandin; awayên şideta fîzîkî û ya derûnî di salên 2022 û 2023yan de yek ji sedemên herî giring e bo serlêdanê.


Zêdebûneke din a berbiçav di grafîkê de jî zêdebûna daxwaza alîkariya madî ye di sala 2023yan de. Hatiye dîtin ku krîzên ekonomîk û polîtîkayên ekonomiyê yên bêewle, hejariya jinan zêdetir kiriye.

## Rapora Lêdanê





Di sala 2023yan de kêmbûneke watedar xuya dibe di wan rêjeyan de bê ka serlêderên tûşî şidetê bûyî xwedî rapora lêdanê ne an na. Di vê kêmbûna sala 2023yan de du faktorên giring derdikevin pêş: Zêdebûna hejariya jinan a ku kûrtir dibe û wernegirtina xizmeta bi zimanê dayîkê ya wek mekanîzmaya şideta hemberî jinan.

## Failê Şidetê




Hatiye çavdêrîkirin ku hejmara wan serlêderan li gor 2022yê zêdetir bûye ku ji aliyê mêrê xwe tûşî şidetê bûne.

## Cihên ku Ew lê Hatine Arastekirin




Di sala 2023yan de hejmara kesên li ser daxwaza alîkariya edlî bo Baroya Wanê hatine arastekirin zêde bûye. Ji ber ku li Wanê û bajarên derdorê stargeh nînin, hejmara serlêderên bo Navenda Çavdêrî û Astengkirina Şidetê (ŞÖNİM) hatine arastekirin kêm bûye ku ŞÖNİM di mekanîzmaya astengkirina şideta hemberî jinan de wek merhaleya yekem dixebite. Yek ji sedemên vê kêmbûnê jî ew e ku jin naxwazin biçin ji ber ku ev navend van xizmetên astengker bi xurtî dabîn nakin.

## Jinan çawa biryar da serî li komeleyê bidin?

Di çarçoveya xebata çavdêriyê de hevdîtinên rûbirû bi 10 jinan re li ser formên hevdîtinê yên nîvçêkirî pêk hatine.

Navgîna serlêdanê ya serlêderên komeleyê di van hevdîtinan de, li gor temenê wan diguhere. Koma 24-34 salî di ser medyaya civakî re gihiştiye komeleyê, serlêderên 34 salî û mezintir jî piranî diyar kirine ku bi beşdariya atolyeyên li taxê hay ji komeleyê çêbûne.

Bi gotina serlêdereke ku biryar daye serî li komeleyê bide;

> *"Têk çûbûm û bi salan li bendê mabûm zarok mezin bibin. Gava keça min lêdan xwar, hatim saziya we û bi piştgiriya we ya bo keça min, taqeta min çêbû serî lê bidim."*

Hatiye dîtin ku jinên serlêder xwe bêçare his kirine û heta kêliya dawî jî xwe ji serlêdanê dûr kirine. Mimkin e bê gotin ji ber ku tiştek di dest jinan de nemaye ji bilî rûbirûbûna rasterast a bi zehmetiyên jiyanê re, bi hêviyeke dawî serî li komeleyê dane. Diyar e ku krîmînalîzasyona bo qada sivîl a 5 sal in li nav Wanê pêk tê, sedemek e ku jin xwe ji daxwaza piştgiriyê bidin alî. Wan qal kiriye ku herçend daxwaza wan a serlêdanê hebûye jî, lê ev yek ji ber sedemên madî û civakî hatiye astengkirin. Bo

nimûne serlêdereke li gund diyar kiriye ku berê haya wê ji komeleyê çêbûye bi pêşniyaza hevaleke wê ya li bajêr û agehdar ji komeleyê, lêbelê ji ber ku çûna wê ya bajêr ne zêde bûye û qezenca wê ya madî têra vê yekê nekiriye, wê jî biryara xwe ya serlêdanê taloq kiriye.

Sedemeke din a berbiçav a tesîr li serlêdana komeleyê kirî ew e ku baweriya bi rêxistineke civaka sivîl ji asteke diyar kêmtir bûye. Ev pêbawerî weha hatiye bilêvkirin:

> *"Min nedikarî telefonî polîsan bikim, çinku dê talûke bûya bo min ku ev bûyer li derdora me bihata bihîstin, loma min xwest xwe bigihînim komeleyan. Piştre gava min hûn dîtin, tekane tirsa min ew bû ka ez wî mafê xwe yê lêgerînê bo cihekî rast bi kar tînim an na û ji ber ku navê min hinekî cuda ye (diyar dike ku navê wê bi kurdî ye) ev dê bibe asteng komele alîkariya min bike an na."*

Em dê di qonaxên cuda yên qismên paştir de vê şideta kulturî-binyadî û pênebaweriya di mijara xwegihandina xwebexşên civaka sivîl û parêzvanên mafan de bibînin.

## Berî serlêdana komeleyê, serî li kîjan saziyan dihat dayîn?

Serlêderên li gund di çarçoveya xebata çavdêriyê de li hember vê pirsê diyar kirin ku herçend fikirîne serî li jendirmeyê jî bidin, lê bi fikar bûne ji ber ku guman kirine ev yek dê paştir li nav gund bibe sedem rastî zordestiyê bên. Lêbelê em dibînin ku serlêderên serlêdana şidetê berî komeleyê bi piranî çûne cem polîsan û saziyên tenduristiyê. Herweha serlêderên li deverên derbajar jî berî komeleyê bi piranî çûne saziyên tenduristiyê. Serlêderên xwedî daxwaza piştgiriya civakî jî bi piranî çûne serî li beşên îdarî yên wekî Walîtî, Şaredarî û Qeymeqamiyê dane, lê piştî ku ti bersivek wernegirtine hatine komeleyê. Em vê yekê di çarçoveya kêmasiyên giring de dinirxînin ku jin li Wanê di xwegihandina pergala têkoşîna hemberî şideta jinan de tûşî wê dibin.

Sînordariyeke din a giring û krîtîk bo xwegihandina mekanîzmayên serlêdanê di astengkirina şideta hemberî jinan de jî ew e ku di vê mijarê de rê li ber jinan nayê vekirin û tên tenêhiştin, weha tê kirin ku fedî bikin û sûcê failê şidetê bigirin ser xwe. Em dikarin vê yekê jî wekî şideteke li xwe ya kulturî bi nav bikin. Serlêder weha gotiye li ser dudiliya newekheviya zayenda civakî û kêmasî û seqetiyên binyadî ku bûne sedema vê yekê:

> *"Min nekarî xwe bigihînim kesî. Bo min gelek zehmet bû. Min zanîngeh xelas kiribû, nasnameyeke min a dîndar hebû, min dizanî ku min serî li ku bidaya ez dê bi paş de vegeriyama malê û dibe ku hem malbata min hem malbata wî dinya li min bikira dojeh. Li derveyê bajêr zewicî bûm. Li bendê bûm werim Wanê da ku hin tiştan bikim. Gava hatim Wanê jî, rasterast çûm cem parêzer bo ku jê veqetim."kullanabilirsin dediler."*

## Piştî şidetê herî pêşî serî li ku hat dayîn û çawa bi encam bû?

Hat çavdêran ku kesên hevdîtinê bi ti awayî behsa şideta li wan nakin û rêjeya bikaranîna Sepana Piştgiriya Jinan (KADES) a serlêderan gelek kêm e di bûyerên şidetê de ku berdewam û zêdetirî carekê diqewimin. Me di hevdîtinên rûbirû yên digel 10 jinan de dît ku tenê jinek sepana KADESê bi kar tîne. Herweha em dibînin ku jinên li derbajaran ji ber dînamîkên civakî û zehmetiyên ragihandinê, nikarin xwe bigihînin ti mekanîzmayeke piştgiriyê. Mirov dikare bibîne ne rêyeke ewle ye ku jinên mexdûr ên li derbajaran wek wasiteyeke serlêdanê di xwegihandina mekanîzmayên piştgiriyê de serî li jendirmeyê bide.

> *"Ez ji salên ewil ên zewaca xwe û vir ve rastî şideta xwesûya xwe, mêrê xwe û tiyê xwe têm. Min serî li ti cihî neda. Ji ber ku tenê jendirme tê gund, tirsiyam ji wan re jî bêjim ku xelk dê bibihîze. Rojekê min gazî ambulansê kir, şidet li pişta min hatibû kirin, ew hatin. Min lavayî wan kir ku min xelas bikin lê wan tiştek nekir. Wan tiştek li telefona min bar kir (behsa sepana KADESê dike) û got eger cardin biqewime dikarî vê bi kar bînî."*

Serlêdera hevdîtinê, ji bo pirsa me ya derbarê rapora lêdanê de got xizmeta bi zimanê dayîkê hilnade:

> *"...Gelek biçûk bûm gava ku zewicîbûm û min dixwest ji lêdanê xelas bibim, rojekê biçim nexweşxaneya welidînê û qala derdê xwe bikim, piştgiriyê ji mirovên wê derê bixwazim. Li nexweşxaneyê dor hatibû min, lê piştre ji ber ku doktorê wê derê gotibû ku bi kurdî nizane, dişa min a li gel min jî gazî hundir kiribû. Helbet êdî min jî nekarî wê plana xwe pêk bînim. Min fam kiribû ku êdî gelekî bêçare me. Pir zehmet e ku karmendên tenduristiyê bi zimanê me nizanibin..."*

Serlêdereke li ŞÖNİMê ji ber ku li Wanê stargeheke mirovan nîne, weha qala rewşê kir:

> *"Ez 6 hefteyan li ŞÖNİMa Wanê mam. Tobe ku ez careke din biçim wir. Em 6 jin di heman odeyê de diman. Her tişt pir qirêj bû. Avahî pir xerab bû. Xwarin pir xerab bûn. Ez 6 hefteyan tenê carekê rastî derûnnas hatim, ew jî mêr bû û heçku ji me nefret dikir. Ya rastî min weha hizir dikir ku dê li wir xwendin û nivîsînê hînî me bikin, lê ew bi xwe jî nebû. Hin jinên pir dîndar hebûn, wan hin gotûbêj pêk dianîn lê ew jî bi tirkî bûn. Ez şikiriya xwe tînim ku ji wir xelas bûm berî ku derûna min xerab bibe."*

Tê dîtin jinên ku di ser vê yekê re dixwazin şideta bûyî bi pêş de bibin û veguhêzin mekanîzmaya piştgiriyê, ji ber ku mekanîzmayên çûnûhatin, xwegihandin û xizmeta zimanê dayîkê ne bi înîsiyatîfa hiqûqî lê bi mefhûma malbata pîroz navbeynkariyê

dikin, bi fikar tên astengkirin. Em ji gotinên hevdîtinan dibin şahidê vê yekê ku têkoşîna jinan herî pêşî di nav diyaloga navbera jinan de dest pê dike, û ji van diyalogan tê famkirin ku çîna civakî bê cudahiya temenî berdewam dibe û her jineke ku nikare ji astenga xwegihandina mekanîzmayan bibihure bi jineke dîtir re xurt dibe:

> *"Gava cara ewil hatim, çûm cem hevaleke xwe ya femînîst. Wê jî ji min re behsa Komeleya Jinan a Starê û Morçatıyê kir. Tecribeyeke weha bû ku mirov pir bihêz dikir û nedihişt mirov xwe bi tenê his bike. Lê ji ber ku ev der bajarekî biçûk e û dizanim ku polîs û saziyên din bi hesasî naxebitin, min serî li wan saziyan neda û neçûm tevî ku min dizanî divê serî li wan bidim."*

## Rêjeya agahiyên derbarê mafan û mekanîzmayên peywendîdar de

Jinan di hevdîtinan de diyar kirine ku ew di dema şidetê de ne xwedî agahiyeke zêde bûne derbarê mafên xwe û mekanîzmayên peywendîdar de. Ji 10 jinên ku hatine hevdîtinê, 7ên wan gotiye ku eger berê xwedî agahî bûna, berî salan dê tevbigeriyana û evqas sal dê tûşî şidetê nebûna. Piraniya wan qal kiriye ji ber ku hay ji mafên xwe nebûne û kesî berê wan nedaye cihên rast, mecbûr mane bi salan tehemulî şidetê bikin. Jinan di hevdîtinê de diyar kiriye ku ew pir paşê hîn bûne ka dê di dema şidetê serî li kîjan mekanîzmayan bidin û wan gotiye ku van mekanîzmayan dê gelek tiştên jiyana wan biguherandana eger berî dema şidetê û di dema şidetê de hay ji wan hebûna.

Li ser pirsa sazî û mekanîzmayên heyî di mijara têkoşîna li dijî şideta jinan de, jinan diyar kiriye ku dibe serî li polîsan û Midûriyeta Bajêr a Xizmetên Malbatî û Civakî bê dayîn. Li ser pirsa ŞÖNİMê, wan piranî gotiye "*çêtir digirim ku neçim wê derê*." Herweha diyar kirine ku stargehek jî bo wan nîne û gilî û gazinên xwe yên ji ber vê yekê anîne ziman.

# ENCAM Û PÊŞNIYAZ

Rapora bi sernavê (E/CN.6/2021/3) ya ji aliyê Sekreterê Giştî yê NYyê ve di danişîna 65em a Komîsyona Statuya Jinan a NYyê de hatiye pêşkêşkirin (li gor vê raporê divê wekheviya zayenda civakî pêk bê, hemû jin û zarokên keç bi temamî û xurtî tev li pêvajoyên biryardanê û jiyana giştî bibin ji bo ku bihêztir bibin, û şidet ji holê bê rakirin), ji ber dîroka xwe ya nêzîk bûye bingeha vê xebatê jî û li gor vê em dixwazin pêşniyazên xwe cardin bi dengekî bilind neqil dikin.

Em wek Komeleya Jinan a Starê di dema amadekirina raporê de xwedî wê berpirsyariyê bûn ku em li ser her bêparbûnekê hûr bibin û dezavantajiya xweser, dînamîk û terîtoryal berbiçav bikin gava em dosyeya her cure şideta hemberî jinan û newekheviya bo jinan vedikolin.

Fatma Altınmakas bûye sembolek di mijara pêdiviya jinan a zimanê dayîkê de. Ew dema ku tûşî şidetê dibe pirsgirêka zimanê dayîkê derdikeve pêş wê di xwegihandina mekanîzmayên serlêdanê de. Ji ber ku nehat hiştin xwe îfade bike û ji aliyê hêzên ewlekariyê ve hat paşguhkirin, em ji roja ewil de dosyeya wê dişopînin û wek rêxistineke mafparêz ev şopandin cardin giringiya van xebatan anî bîra me. Em ji ber encamên vê rapora çavdêriyê û xwegihandina edaletê ya bi tecribeyên xwe dizanin ku mafê zimanê dayîkê xwedî giringiyeke mezin û kartêker e di xebata têkoşîna giştgir a li dijî şideta jinan de.

Şideta li dijî jinan, armanca wê ew e ku jinên temsîla nîviyê nufûsa dinyayê kirî di bin zext û kontrolê de bin û yek ji astengên herî mezin e li ber pêşketina potansiyele heyî ya jinan. Cudakerî û şideta hemberî jinan tê wateya îhlalkirina mafên mirovî yên jinan. Berpirsyariyên neteweyî û navneteweyî yên dewletan e ku mafên mirovî yên jinan bên naskirin û parastin, îhlalên mafên mirovî yên jinan bên astengkirin û musebibên vê yekê bêne cezakirin. Berpirsyariya jinavbirina cudakerî û şideta li dijî jinan û pêkanîna wekheviya jin û mêran di wan peymanên navneteweyî de de hatiye pênasekirin ku Tirkiye jî alîgirê wan e. CEDAW û Peymana Stenbolê ku metnên herî serekî ne li ser van standardan, madeyên wan di çarçoveya qanûnî ya neteweyî de jî hatine nîşandan. Tetbîqkerên mekanîzmayên parastina jinan ji şidet û cudakeriyê, pergala darizandinê û endamên wê, kadroyên saziyên giştî yên peywendîdar, pergal û xebatkarên ewlekarî û tenduristiyê divê li gor standardên neteweyî û navneteweyî biryaran wergirin û wezîfe û berpirsyariyên xwe pêk bînin. Ji bo ku tenzîmên qanûnî bikevin meriyetê, divê ji aliyê tetbîqkeran ve ev tenzîm û madeyên wê baş bêne famkirin û qebûlkirin.

## Pêşniyaz

- Di serî de CEDAW û Peymana Stenbolê, tenzîmên serekî yên navneteweyî yên bi armanca parastina mafên mirovî yên jinan ku Tirkiye jî alîgirê wan e û di serî de qanûna hejmar 6284ê, hikmên mewzûata neteweyî yên berdest û li ser bingeha van tenzîman, divê ji aliyê mekanîzmayên tekoşîna li dijî şideta jinan ên li Wanê baş bê famkirin, qebûlkirin û tetbîqkirin.

- Divê çi li saziyên giştî çi li saziyên civaka sivîl ên li Wanê, pisporên kurdîzan bêne xebitandin. Herweha divê xizmetên pêşkêşkirinê yên saziyên giştî yên vê qadê li Wanê hebin da ku xizmeta bi zimanê dayîkê bidin serlêderan.

- Hikmên di Qanûna hejmar 6284ê û Rêziknameya Derbarê Navenda Çavdêrî û Astengkirina Şidetê de, divê ji aliyê saziyên berpirsyar ên parastina jinan ji şidet û cudakeriyê ve bêîstîsna bêne tetbîqkirin.

- Divê pêvajoyên îdarî, hiqûqî û edlî yên li Wanê bi lez bi encam bibin, pergala darizandinê û endamên wê divê tenzîmên neteweyî li gor standardên navneteweyî şirove û tetbîq bikin.

- Divê derbarê mewzûatê û tetbîqên rast de atolyeyên rênîşan bo xebatkarên saziyên li Wanê yên wekî Midûriyeta Bajêr a Xizmetên Malbatî û Civakî û Weqfa Civakî ya Alîkarî û Hevgirtinê bên çêkirin. Herweha divê kar, wezîfe û berpirsyariyên di telîmatnameyan de bi zelalî bêne diyarkirin û bibîrxistin bê ka divê xebatkarên li van saziyan li gor kîjan prensîb, helwest û çarçoveyê bixebitin.

- Divê sazî demildest wan biryarên parastina jinan a ji şidetê wergirin da ku jin tûşî trawmayên duyem nebin an jî piştî gilîkirinê nekevin nav çerxeke nû ya şidetê. Hewce ye pêvajoyên hiqûqî bêne bilezkirin ji bo ku edaleta civakî bê cîbicîkirin.

- Divê jin bêne teşwîqkirin ji bo ku xwe bigihînin mekanîzmayên têkoşîna li dijî şideta jinan.

- Divê mekanîzma û xizmetên eleqedar ên li Wanê yên li ser têkoşîna hemberî şidetê ji bo wan gund û taxên derbajar bê nasandin ku ji gelek derfetan bêxeber in û divê jin bên teşwîqkirin û handan ku mafên xwe hîn bibin.

- Her wekî ku di Rêziknameya Derbarê ŞÖNİMê de hatiye pênasekirin, divê personelên wesfdar bêne îstihdamkirin.

- Divê di bûyerên şidetê de psîko-perwerdehiyên bi komên diyarkirî ji bo kesên fail bên dayîn û di perwerdehiyê de divê agahiyên li ser şidetê, faktorên şidetê, encamên hiqûqî û civakî yên şidetê bêne dayîn. Divê xebatkarên li saziyên giştî û saziyên civaka sivîl ên di qada şideta hemberî jinan de perwerdehiya mafên mirovan wergirin û kesên xwedî fikra mafparêziyê di wan beşan de bêne xebitandin û bi liyaqeteke mutleq bêne wezîfedarkirin.

- Ji bo maweya mana li stargehê û piştî wê, divê jin bên teşwîqkirin tev li perwerdehiyên pîşeyî bibin da ku tev li jiyana karî bibin. Da ku astenga duyem li ber xebitîna jinan rabe, divê jin bêpere bikarin zarokên xwe danin kreşan an jî qadên li gor zarokan. Jinên di bin talûkeyê de piştî ku ji stargehê vediqetin, divê di dema avakirina jiyaneke nû de piştgiriyeke ji aliyê kirêya malê, potên zarokan, xwarina zarokan, zad û fatûreyan ve bo wan bê kirin.

- Di bûyerên her awayê şideta hemberî jinan de, her wekî ku di Peymana Stenbolê de hatiye, navbeynkarî û lihevkirin jî tê de, divê pêvajoyên mecbûrî yên alternatîf ên lihevnekirinê neyêne tetbîqkirin û divê tedbîrên hiqûqî û yên din ji bo qedexekirina van yekan bên girtin. Di Qanûna Navbeynkariyê ya Lihevnekirina Hiqûqî de jî, giring e ku hatibe diyarkirin lihevnekirinên xwedî îdiayên şideta navmalî ne misaid e ji bo navbeynkariyê.

- Li gor Qanûna Şaredariyê, şaredariyên bajarên mezin û şaredariyên nifûsa wê zêdetirî 100.000î mecbûr in mêvanxaneyan bo jin û zarokan vekin. Şaredariyên din jî li gor rewşa xwe ya darayî û xizmetên hewcetir, dikarin ji bo jin û zarokan mêvanxaneyan vekin.  Li gor îstatîstîkên 2021ê yê Wana xwedî nifûsa 862.757î, divê li navenda bajêr û navçeyên wê li gor vê qanûnê stargehên mirovan bên vekirin.

- Hêzên ewlekariyê yên di nav mekanîzmayên şideta hemberî jinan de, hemû beşên di bin banê Wezareta Xizmetên Malbatî û Civakî de, endamên dozgeriyê, xebatkarên Dadgehên Malbatî û buroyên alîkariya edlî, xebatkarên tenduristiyê, divê faydeya giştî ya jin û zarokan li ber çavan bigirin û li gor tenzîmên neteweyî û prensîbên pîşeyî şêwirmendî, xizmet û rêberiyê bikin.

- Divê ji aliyê ŞÖNİMan ji bo jinan piştgirî û perwerdehiya derûnî bê dayîn bi armanca ku cardin venegerin nav qadeke şidetê an jî tûşî şidetê nebin piştî ku ji stargehan vediqetin û divê armanc ew be ku jin bikarin bi serê xwe bin û bihêztir bibin.

- Divê teqez li mekanîzmayên wekî hêzên ewlekariyê yên li nav ŞÖNİMa Midûriyeta Xizmetên Malbatî û Civakî, odeyên cuda yên hevdîtinê bêne çêkirin. Divê ŞÖNİM xwedî amûr û şertên fîzîkî be, her wekî ku di rêziknameya peywendîdar de çarçoveya wê hatiye danîn.

- Personelên li sazî û dezgehên Wanê yên qada şideta hemberî jin û zarokan, divê teqez perwerdehiya xizmeteke navxweyî derbarê şidet û cudakeriya hemberî jinan de wergire û divê di van qadan de pisporên xwedî tecrube bêne xebitandin.

- Divê di navbera hemû saziyên civaka sivîl û saziyên giştî yên vê qadê yên Wanê de, hevkarî û koordînasyoneke berdewam pêk bê.

- Ji bo bihêzkirina xebatkarên li nav mekanîzmayên têkoşîna şideta hemberî jinan, divê sazî û dezgehên eleqedar ên li Wanê car caran çalakiyên cuda yên bi mebesta bêhnvedan û motîvasyonê pêk bîne da ku rê li ber xemsarî û trawmayên duyem ên xebatkaran bê girtin.

- Divê piştgiriya çavdêriyê bo pisporên qada şideta hemberî jinan ên li saziyan bê dayîn.

# Têbînî

**Komeleya Jinan a Starê**
**Navnîşan:** Şerefiye Mahallesi Milli Egemenlik Caddesi
Karizma İş Merkezi No: 11 Kat: 4 Daire: 30 İpekyolu/Van
**Telefûn:** 0501 365 14 65
**Email:** strkdn65@gmail.com
**Twitter:** @DernegiStar